

Werzîş



Mejiyê Dirust Di Laşê Dirust De Ye



Werzîş: Bikarînana endamên leşî ye ji bo bihêzkirina masolkeyên wî. Werzîş gelek cor e ji wan:




● Werzîşa laşî.



● Werzîşa laş ciwanîyê.



● Werzîşa helgirtina asni.



● Boksanê.



● Xwelêkdan û corêñ wê.



● Futbol (tepa pêî).



● Vulibol.

● Baskêt.

● Pîng pon (tensa mêzê).

● Melevanî.

● Xwehlîsandin û corêñ wê.

● Hesp siwarî.



● Tepa avê.

● Tenis.

û gelekên dî.

Hindek ji van werzîşan bi kom dihêne kirin û hindek jî bi kit. Her hemî jî mirovî han diden ji bo harîkarî û sinc û rewiştên bilind.

Werzîş bi rastî huner û zansite û ji bilî ku tendrustîya me baş diket xweşîyeka mezin jî didete me lewa pêwîste em hemî corekî an pitir ji corêñ werzîşê bikeyn.





Ji Yaneyê
Kurdistanê..

Yaneya Dihokê

Yaneya Dihokê kevintirîn yane ye li parêzgeha Dihokê. Ev yane ye li sala (1971) ê hatîye damezrandin û heta nûke ya berdewam e di pişikdarîya qaremanîyên Îraqê û Kurdistanê da.

Li vê yaneyê ev yarıye dihêne kirin: futbol, baskêt, vulibol, tepe destî, yarıyên gorepanê, tepe mêmê ya kur'an û kiçan, karatê, buksanê û taykwando.

Vê yaneyê heta nûke gelek serkeftin li ser astê Îraqê û Kurdistanê bi dest ve ïnayne. Her sê tîmên wê yên futbol baskêt û vulibolê di pileya nayab ya xula Îraqê da yarıyê diken. Li sala (2005)ê her dû tîmên wî yên futbol û baskêtê cama herêma Kurdistanê bi dest ve ïnan. Her wesa cama qaremanîya herêmê ya yarıyên gorepanê jî bi dest ve ïnaye. Di vê yaneyê da gelek yarîkerên navdar serhildaye wek:

Li Dîdara Kepirê

Sîrwan Miweffeq

Sîrwan Miweffeq yarîkerekê zîrek û çelengê tênisâ erdî ye. Temenê wî (13) salin û xwendekare li kilasa êkî navincî di gel helbijartiyê Yaneya Dihokê yarıyê diket.

Sîrwan dibêjît: "Ez hez dikem di paşerojê da bibime endazîyar lê ez gelek ji werzîşê hez dikem û bi taybetî (Tenisa Erdî) ku hemî hêvîya min ewe bibime yarîkerekê dewlî. Eve bi tenê dû sale Sîrwan vê yarıyê diket di ser hindê ra şîya pileya çarê li ser astê Îraqê bi dest xwe ve bînît. Baştırîn encam bi dest ve ïnayî serkeftina wî bû li ser yarîkerê helbijartiyê Îraqê (Şehab Ehmed)."

Sîrwan dibêjît: "Ez gelek supasiya mamê xwe (Ebdû Irezaq Salih) û her dû rahênerên xwe (Avdel Hesen) û (İmad Mistefa)î dikem ji bo piştevanî û handana wan ya berdewam." şîreta wî bo hevalên wî ewe: "Werzîşê biken û li xwendegehê jî zîrek bin." Li dû mahîyê dibêjît: "Ez spasîya Kepirê dikem li ser vê dîdarê û Kepir bi rastî kovareka ciwan û sernicrakêse."



Casim Mihemed Hacî

Xalid Mişîr (ku nûke di nav helbijartiyê Îraqê yê futbolê da yarıyê diket).

Diyar Hesen, qaremanê Îraqê bi xwehavêtina êk gavî û sêgavîyê. digel çendîn yarîkerên dî yên ku li ser astê Îraqê û Kurdistanê di navdarin.

